

Die Senatorin für Kinder und Bildung · Rembertiring 8-12 · 28195 Bremen

Ji bo
Dêûbavan ango Peywirdarên Lênêrîna Zarokan

Auskunft erteilt
Helena Justa

Zimmer 411

Tel. 0421 361-12604

Fax 0421 496-12604

E-Mail:
helena.justa@
kinder.bremen.de

Mein Zeichen
(bitte bei Antwort angeben)
30-1

Bremen, 30.04.2021


Stî û mîrzayên rêzdar,
dêûbavên hêja ango peywirdarên lênêrîna zarokan,

ev salek e, korona jiyana me ya rojane diguherîne. Em dixwazin bibin alîkar, ku zarok li hêlînan bi vîrusê nekevin. Wekî din em dixwazin, ev sazî ji bo tevahiya zarokan, bi qasî ku pêkan e, vekirî bimînin. Îro ez di derbarê tedbîreke nû ya ji bo parastina zarok û xebatkarên hêlînên zarokan de agahî didim we.

Bi riya hêlîna xwe ya zarokan hûn ê di demeke nêzîk de testa xweser/hêsan ji bo zarokên xwe bigirin. Ev test bi riya piştgiriya zanistî hatine hilbijartin û ji bo zarokan ne xetere ne. Testkirina zarokên we bi awayekî dilxwazî pêk tê. Lê belê ez ji we gelek rica dikim, ku hûn hefteyê du caran testa zarokê/a xwe çêkin. Hûn testa xweser rojên duşem û pêncşeman li malê li ser zarokên xwe beriya serdana hêlîna zarokan çêkin. Wisa hûn dikarin bibin alîkar, ku gelek mirov werin parastin. Gava we testa xwe li malê ji bîr kiribe, hûn dikarin bi îstîsnayî li hêlîna zarokan testê çêkin.

Gava encama testê negatîv be, hingê hûn ji kerema xwe re pela encaman ya li gel vê dagirin. Ji kerema xwe re vê pelê di heman rojê de radestî hêlîna zarokan bikin.

Gava encama testê pozîtîv be, zarokê/a we nikare were hêlîna zarokan û divê li malê bimîne. Ji kerema xwe re demildest bi riya telefonê agahî bidin hêlîna zarokan. Piştî vê yekê rasterast randevûyekê ji bo testa PCRê eyar bikin, da ku encama testê were kontrolkirin. Bi vê yekê re telefonî vê hejmarê bikin **361 10100**. Gava encama testa PCRê pozîtîv be, ji kerema xwe re hêlîna xwe ya zarokan agahdar bikin. Hingê divê zarokê/a we îzole bibe. Divê her wisa hûn jî testa xwe çêkin.

 Eingang:
An der Weide 50

Dienstgebäude:
An der Weide 50
28195 Bremen

Bus / Straßenbahn:
Haltestelle
Hauptbahnhof

Sprechzeiten:
montags bis freitags
von 9:00 - 14:00 Uhr

Bankverbindungen:
Deutsche Bundesbank
IBAN: DE 16 2500 0000 0025 0015 30
Sparkasse Bremen
IBAN: DE 73 2905 0101 0001 0906 53

Gava encam negatîv be, zarokê we dikare were hêlîna zarokan.

Pêvajoya Agahiyê

Ji kerema xwe re testa xweser/hêsan bikin

- Hefteyê du caran (rojên duşem û pêncşeman)
- Bi zarokê/a xwe re li malê
- Beriya serdana hêlîna zarokan

Vîdeoyeke ji bo çêkirina testê, li ser malpera Senatora ji bo Zarok û Perwerdehiyê heye

(<https://bildung.bremen.de/sixcms/detail.php?gsid=bremen117.c.237989.de>)

Encama Negatîv a Testê

↓
Zarokê/a we dikare were hêlîna zarokan.

↓
Ji kerema xwe re pela li gel vê dagirin. Ji kerema xwe re vê radestî hêlîna zarokan bikin.

Encama Pozîtîv a Testê

↓
Divê zarokê/a we li malê bimîne.

↓
Ji kerema xwe re encama testê ji hêlîna zarokan re bibêjin

&

Ji kerema xwe re ji bo zarokê/a xwe Testa-PCRê bidin çêkirin. Telefonî vê derê bikin:

0421 361 10100

↓
Encama vê testê jî ji hêlîna zarokan re bibêjin.





↓
→ Gava encama testa PCRê negatîv be, zarokê/a we dikare dîsa here hêlîna zarokan.






→ Gava encama testa PCRê pozîtîv be, hêlîna xwe agahdar bikin. Divê Zarokê/a we îzole bibe.

Agahiyên din ên li ser testê

- Ev test, *Novel Coronavirus (COVID 19) Antigen Test Kit e (Colloidal Gold) NASAL* ji LYHER®.
- Ev test hem ji aliyê Enstîtuya Paul-Ehrlich û hem jî ji aliyê Enstîtuya Federal a ji bo Derman û Berhemên Tibbî wekî testeke hêsan destûr girtiye, her wisa ji bo zarokan.
- Nîmûne ji hundirê pozî tê girtin.
- Ji kerema xwe re beriya çêkirina testê rêbernameya wê bixwînin û bi destên xwe yê şûştî testa zarokê/a xwe çêkin.

Gavên sereke ev in:


<p>1. Şiva bi pembû (bêyî ku destê we li pembûyê bikeve) ji testdankê derxin û hete bigihije dawî û li ciyekî bikeve bi baldarî bi qasî 1-2 cm bixin nav qula pozê zarokê/a xwe.</p>	
<p>2. Serê şiva bi pembû di nav qula pozê zarokê/a xwe de 5 caran bizivîrînin.</p> <p>3. Şivê ji nav qula pêşîn a pozî derxin û bi heman awayî bixin nav qula din a pozî. Şivê di wê derê de jî 5 caran bizivîrînin.</p>	 <p>Innerhalb 7-10 Sek. 5-mal drehen</p> <p>Innerhalb 7-10 Sek. 5-mal drehen</p>
<p>4. Devikê tûpa nimûneyê vekin û şiva bi pembû bixin nav tûpê.</p> <p>5. Tûpa nimûneyê 10-15 caran bidewisînin, ji bo ku nava tûpê û şiva bi pembû bi hev ve bimînin.</p> <p>6. Deqeyekê bisekinin.</p>	
<p>7. Şiva pembûyê jê derxin û serê dilopkerê („devik“) li ser tûpê bidewisînin.</p>	

<p>8. Rahijin seta testê û ji dilokerê 3 dilopan ji tûpê valayî ser qula nimûneyê bikin (S) di seta testê de.</p>	
<p>9. Piştî 15 deqeyan hûn dikarin encamê bibînin.</p> <div style="display: flex; justify-content: space-around; align-items: center;"> <div style="text-align: center;">  <p>POSITIV</p> </div> <div style="text-align: center;">  <p>NEGATIV</p> </div> <div style="text-align: center;">  <p>UNGÜLTIG</p> </div> </div>	<div style="text-align: center;">  15 Deqe </div>

Gava hûn dudilî bin, hûn dikarin çî bikin?

- Hûn dikarin careke din testê çêkin, an jî hûn dikarin herin navendeke testê û li wê derê testeke zû ya bê pere bidin çêkirin.
- Gava pirsên we hebin, hûn dikarin her dem xwe bigihînin xeta me ya acîl 0421 361 10100. Em bi dilxwazî alîkarî dikin.

Li gel silavên germ,
Peywirdar



Rêveberiya Daîreya Perwerdehiya Zarokên Biçûk, Piştgiriya Zarok û Pêşketina
Xebatkarên Pispor